

KAOA-kompakt – Ji sala paşîn heta pola 10an oryantasyona kariyerê ji bo koçberên nû

Ev çi ye?

"Ji bo xwendekarên ku cara pêşî di pola 10an de dikevin pergala dibistanê ya li NRWê yan jî beşdarî pola sererastkirinê ya navneteweyî dibin, ji ber neberdewamiya dibistanê ya mayî, ne mimkun e ku hemû pergala KAOAyê bigirin. Li vê derê 'KAOA-kompakt' wekî berhevokeke blokên avahîsaziya navendî ya pergala karîyera berfireh û ahenga xwendinê ya ji KAOA ji bo koma armanc tê pêşkêşkirin.

Ji bo ciwanên meyla wan ya pîşeyî ya destpêkê nîn e bi awayekî guncan hat sepandin."*



Foto: Monstera via Pexels

Karmendên perwerdekirî analîzên

potansiyel bi rê ve dibin û paşê civînên nixandina kesane li dibistanê dikin. Dayik û bav / pasevan bi dilgermî ji bo vê civîna nixandîna têne vexwendin.

Mercên giştî: (Kî, Kengê, Li ku derê, bi çi maweyê?)

KAOA-kompakt pêşniyarek e ji bo:

- Xwendekarên koçber yên nû yên pola 10an
- Şagirtên di pola 10-n de ku ji ber sedemên din (mînak guhertina malê) meyla pîşeyî ya destpêkê wernegirtine.

Di KAOA-kompaktê de xwendekar pêşî beşdarî analîzeke potansiyelê ya durojî dibin. Di pêngava pêştir de, xwendekar di sê rojan de sê qadên pîşeyî yên cihêreng nas dikin, wekî karûbar, metal an hilberîna li Navenda Perwerdehiya Pîşeyî ya Euskirchenê (BZE), berî ku ew qadek pîşeyî bi kûrahî nas bikin. qursek pratîkî ya sê rojan.

Zarok di maweya saleke xwendinê de di van pêvajoyan re derbas dibin.

Peywirên ji bo zarokê we

- axaftina derbarê cerebeyên xwe de bi hevalan û malbatê re yan jî li dibistanê û hizirîna li ser van pirsan:
 - Meyla min li ser kîjan pîşeyan e û çi şiyên min hene?
 - Kêfa min bêtir ji çi re tê û hindiktir ji çi re tê?
 - Kîjan qadên pîşeyî bala min dikişînin?

Hûn dikarin wisa bibin alîkar

- beşdarî şeva agahdarkirinê ya dibistanê bibin
- beşdarî civîna nirxandinê ya ji bo analîza potansiyela we ya li dibistanê bibin
- zarokên xwe teşwîq bikin ku bi awayekî çalak KAoA-kompaktê pêk bînin
- encamê û bandorên di nav malbatê de nîqaş bikin, ji niha ve li ser qonaxa serîlêdanê bifikirin ku nêzîk dibe

* Çavkanî: KAoA kompakt Konzept, MAIS, Düsseldorf, Kanûn 2016, S. 1

Peywendî:

Ofîsa Koordînasyona Şaredariyê (KoKo) Li KoBIZê derbasbûna ji dibistanê ji bo pîşeyê

Bilge Yalcinkaya

Tel.: 02251/15-939

E-Maîl: bilge.yalcinkaya@kreis-euskirchende